Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1245 5-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Mêrva Heyder: Stranbêjî rihetiya can e



Dîlan Mulhim \Qamişlo

**Hunermend û stranbêja Kurd Mêrva Heyder diyar kir bi riya mûzîkê mirov dikare hest û ramanên xwe bîne ziman û wiha got: "Ez bi riya stranbêjiyê hestên xwe parve dikim, her wiha starbêjî rihatiyeke mezin dibe canê mirovan".**

Rojavayê Kurdistanê bi hunermendên xwe yên ciwan dewlemend e, bi taybet jin û zarok û yek ji wan zarokan yên Rojavayê Kurdistanê ku bi hunera û nameya xwe belavî her derê dike, Mêrva Heyder e.

### Kurtejiyan

Hunermeda kurd Mêrva Heyder di sala 2011an de li gundê Sêwiya yê Efrînê ji dayîk bûye, lê demek dirêj li bajarê Helebê jiyan kiriye. Piştire berê xwe daye Tirkiyê û çar salan li wir maye. Carek din vedigere Efrînê û şeş mehan lê dimîne. Bi êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ser Efrînê de, koçberî Kobanê dibe û 5 salan li wir dijî. Piştire ji bo xwendinê berê xwe da bajarê Reqayê û salekê li wir jî dimîne. Piştî wî jî ber xwe dide Qamişlo û li wir jiyan dike.
Di derbarê huner û jiyana xwe de hunermenda kurd Mêrva Heyder ji Rojnameya me re axivî.

### 'Starnbêjî aramiya canê mirov e'

Mêrva Heyder diyar kir ku gelek ji mûzîkê hez dike û wiha got: "Min bi temenekî pir biçûk dest bi dengbêjiyê kir, ji ber ku ez ji malbateke hunerî me. Ez ji bafê xwe fêrî mûzîk û dengbêjiyê bûm, di malbatê de bavê û birayê min li tembûr dixin. Destpêkê min perwerdeya mûzîkê li peymangeha Vejîn li bajarê Kobanê girt. Her wiha min çar salan li peymangehê perwerdeya mûzîkê bir û fêr bûm. Yên herî zêde piştgiriya min dikirin, bav û diya min bûn".

### 'Bi riya mûzîkê mirov hestên xwe parve dike'

Mêrva Heyder da zanîn ku dema ew stranên floklorî dibêje gelekî kêfxweş dibe û wiha bi dawî kir: "Min pirî caran stranên xwe bi komên şahiyên ceja Newrozê re gotine. Stranên di cejnê de ji bon min cihê kêfxweşiyê ne. Di starbêjiya xwe de girîngiyê didim starên flokrola kurdî, her wiha di vê demê de min du kilîp çêkirine û kilîpa destpêkê Çav kilê ye li bajarê Kobanê li navenda Bavê Xido me çêkir. Di heman demê de kilîpa duyemîn bi navê Delalê li bajarê Amûdê li cihê floklorê tevî koma mûzîkê û mamoste Sefqan me çêkir û ez hazirya kilîpeke din jî dikim, her wiha ez bi hêvî me ku vegerim cih û warê xwe li bajarê Efrînê".

# Gerstêrka me berdewam germ dibe



Encamên rasterast ên germahiya global derbarê pêşeroja gerstêrka me de serbendên nexweş dide. Navendên li cemsera bakur ku bi hezaran salan di axa qerisî de karbondîoksît di xwe de kom kirine, niha veguherîne çavkaniyên emîsyonê. Sedema vê yekê jî wekî germahiya global û şewatên daristanan yên girêdayî wê tê dîtin.

### 'Axa ku germ dide rê li ber karbondîoksît û metanê vedike'

Li gor lêkolîna 97 zanyaran kirî, Cemsera Bakur di sala 11'emîn de jî ji asta navînî zêdetir germ bû. Li gor lêkolîneran, niha ji çar qatê navînîya global germahî pêk tê. Di encama vê yekê de karbondîoksît ji atmosferê dûr dikeve lê di heman demê de dibe sedema germbûn û helîna axa qerisî ya ku di xwe de karbondîoksîtê dihewîne. Dema ku vê axê dest bi helînê kir, karbondîoksîta tê de kom bûyî jî sist dibe û karbondîksît û gaza metanê diherike nav atmosferê.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Xwe li ser lingên xwe digire:**
- Xwebixwe dikare debara xwe bike; pêwîstiya wî bi ti kesî nîne. Yeko bi sediyo, sedo bi yekiyo.
- Car heye yek li şûna sed kesî ye û sed kes bi qasî kesekî ne.
Yek e, lê pir bidendik e:
- Yek e lê pir hêja ye.
**Yek e yekane ye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BIKÊRNEHATIN Û BÊSERÛBERBÛNÊ**

**Agir jê naçe:**
- Bêkêr e; alîkarî jê çênabe.
**Beranê bisko bûya wê li ber derê bavo bûya:**
- Eger baş bûya, eger bi kêr bihata, wê ji xwediyê xwe re baş bûya wê bi kêrî mala xwe bihata; ji ber ku bi kêrî tiştekî nayê li cem biyaniyan e
**Beranê çê bûya wê li ber derê bavo bûya:**
- Bi heman wateyê.
**Binê kodika wî qul e:**
- Nikare tiştekî berhev bike; nikare rewşa xwe ya aborî baş bike; şansê wî nîne.
**Bila tu gur bûyayî bila te berê kerê min bixwara:**
- Xwezî tu bi kêr bihatayî bila destpêkê te zerer bida min.
**Bû weke aşê av li ser birî:**
- Betal bû, êdî nexebitî, êdî bi kêrî tiştekî nehat.
**Coya bostana nabe ji bo aşvana:**
- Her tiş ti bo pêwîstiyekê çêbûye; her tişt ji bo her pêwîstiyê nabe.
**Çavnedîtî ye:**
- Dinyanedîtî ye; bêçand e; bêmedeniyet e.
**Darê şkestî ye:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; pir lewaz e.
**Dewla serê te:**
- Jixweve tu mezinê me bûyî, lê tu bi kêr nehatî.
**Dewlet li serê te be:**
- Bi heman wateyê.
**Di ciwaniya xwe de jî di ser zila ketî re baz dida:**
- Di ciwaniya xwe de jî ne ti kinês bû; di ciwaniya xwe de jî bi kêrî tiştekî nedihat.
**Di destê wî de rohn bû:**
- Karê xwe pêk neanî; bi ser neket; ji wî karî fêm nekir; perîşan bû.
**Eger ne seyê nano bûya, wê li ber devê deriyê xwediyê xwe bûya:**
- Eger bi kêrî kar bihata, wê ne li vir bûya.
**Eger seyekî baş bûya wê li ber devê deriyê xwediyê xwe bûya:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Serxistina doza Hevrîn parastina mafê jinên cîhanê tevahî ye'



Sûad Mistefa dayika siyasetmedara kurd û sekretêra Giştî yê Partiya Sûriya Pêşerojê şehîd Hevrîn Xelef, diyar kir ku cihê kujêrên keça wê dadgehe, ne li parlemantoya Sûriyê ye û wiha got: "Ez kujerên keça xwe ti caran weke nûnerên xwe nabînim."**R-6**

## 'Em ê li ser şopa Şehîd Menîce berxwedanê dewam bikin'

**Hevalên Şehîd Menîce diyar kirin ku ew di hevaltî, kar û xebatê xwe de keske pir dirust û fedekar bû, gelek xebat ji bo rêxistina civakê dida meşandin.R-2**



## 'Rêveberiya Xweser ji bo cîhanê tevahî modêla çareseriyê ye'



Dîrektora Lêkolînan ya Enstîtoya Aşitiyê ya Kurdî Meghan Bodette da diyarkirin ku gelê Kurd ne tenê di heremê de, pêwîste di cîhanê giştî de were naskirin û wiha got: "Têkoşîna gelê kurd ji bona hemû gelan bûye mînaka berxwedanê"**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1245 5-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BI QIRKIRINÊ AŞITÎ PÊK NAYÊ

Xebat û hewildanên Rêber Abdullah Ocalan ên ji bo çareseriya doza gelê Kurd û tevahiya gelên herêmê, herwiha çaresekirina tevahiya pirsgirêkên Rojhilata Navîn, bênavber dewam dikin. Di serlêdanên dawî yên Şandeya DEM Partî ji Îmraliyê re û peyamên dîrokî yên Rêber Apo ku bi raya giştî re hate parvekirin, careke din hêza Rêber Apo ya peydakirina çareseriyê hat isbatkirin. Lê li hemberî van gavên aşitiyê, hikumeta AKP-MHP'ê tu gav neavêtin û berovajî wê êrişên qirkirinê yên li dijî gelê kurd li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê zêdetir kirin.**R-4**



## Ji çiraxên wêjeya kurdî



Helbestvana kurd Helîma Can Kobanê Mînaka jina kurd a berxwedêr e ku bûye vejîna civakên kevnar û di civaka nûjen de roleke sereke lîstiye. Jinên kurd bi vê rola xwe şiyana xwe ya ji bo pêkanîna guhertinên erênî di nav wan civakan de nîşan dane.**R-7**

## 'Daxwaza gelên Siwêdayê jî pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser e'

Yek ji endamên şandeya MSD'ê ji bo Siwêdayê Fewzî Şingalî da zanîn ku armanc ji civîna ku MSD'ê li Siwêdayê li dar xist, xurtkirina têkiliyên di navbera gelên Sûriyê de bû û got, "Daxwaza gelên Siwêdayê û piraniya aliyên ku me ew dîtin jî pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser e."**R-5**



Rêxistinkirin wê jinê ji qirkirinê biparêz e — Nehir pale R-2
Şoreşa Rojava tê dizîn — Zekî Bedran R-5

Tîfaqa çaremîn a Kurd û Tirkan — Farûk Sakik R-5

Komunalîzma Demokratîk — Rohat Bulut R-6

Li hember gotara nefretê .. rola rewşenbîran — Kemal Necim R-7

# ‘Em ê li ser şopa Şehîd Menîce berxwedanê dewam bikin’

Hevalên Şehîd Menîce diyar kirin ku ew di hevaltî, kar û xebatê xwe de keske pir dirust û fedekar bû, gelek xebat ji bo rêxistina civakê dida meşandin. Her wiha heta dawiyê em ê li ser doza Şehîd Menîce berxwedanê berdewam bikin.

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Gel ji bo piştgiriya şervanên QSD’ê bikin û moralekî bidin şervanên di çeperên şer de, berê xwe da bendava berxwedanê; Bendava Tişrînê. Her wiha dema ku gel nobetê dikin, dewleta Tirk êrişî sivîlan kir di encamê de şeş welatî şehîd bûn û 21 sivîl birîndar bûn. Yek ji wan jî jina bi navê Menîca Heyder şehîd bû.

Di derbarê bandora Şehadeta Şehîda Menîce û hevaltî, kar û xabatên wê Endama Meclîsa Jin a Partiya Yekîtiya Dîmokratîk PYD‘ê Menal Mihmed û Endama Kongra Star Ranya Salih ji Rojnameya me re axivîn.

**Kar û xebatên Şehîd Menîce**

Menal Mihamed anî ziman ku şehîd Menîce di karê xwe de gelek serkeftî bû û wiha got: “Şehîd Menîce demeke dirêj bû ku têkoşîn û berxwedanî dikir û li gel karê xwe yê malê kar û xebatên civakê jî dida meşandin. Her wiha di karê xwe de ew keseke jî û jêhatî bû, heval û dostên wê jê razîbûn. Di heman demê de şehîd Menîca di gelek misyonan de cihê xwe girt, cihê xwe di qada civakî de Kongra Star û Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ ê de girtibû. Dema ku derbasî kar û xebatên PYD’ê bû, cihê xwe di rêveberiya hevbeş a bajarê Qamişlo ya partiyê de girt û demekê di Kongra Star de jî kar kir. Şehîd Menîce her tim digot heta ku em bigihêjin azadiya xwe, pêwîste jin têkoşîn û berxwedaniyê bike û ti carî bê hêvî nemîne”.

**Hevaltî û Bandora şehadeta Şehîd Menîce**

Endama Meclîsa Jin a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD‘ê Menal Mihmed da zanîn ku Şehîd Menîce di hevaltî, kar û xebata xwe de pir dirust û fedekar bû û wiha bi dawî kir: “Şehîd Menîce di kar û xebatên xwe de gelek êş û zehmetî dikaşandin ruxmî wê jî di karê xwe de serkeftî bû. Di heman demê de Şehîd Menîce têkilyên wê bi her kesî re hebûn û bi her kesî re weke hevalan bû û keseke hezkirî bû diket dilê her kesî, her wiha dema ku ew çû bendavê û me dîmenên wê didîtin em kêfxweş dibûn. Lê ruxmî


Menal Mihmed


Raniya Salih

wê şehadeta Şehîd Menîce bandorek mezin li her kesî ku wê nasdike kir bi taybet malbat, dost û hevalên wê. Gotina dawî ya Şehîd Menîce ku berî biçe bendava Tişrînê ew bû: “ez ê herim Bendava berxwedanê ji bo ku hevalên min bi tenê nemîn” Emê heta dawiyê li ser şopa Şehîd Menîce têkoşînê berdewam bikin”.

**‘Şehîd Menîce kesek fedekar bû’**

Di heman demê de Ranya Salih da zanîn ev 12 salin ku şehîd Menîce nas dike û wiha got: “Şehîd Menîce di hevaltiya xwe de kesek rast bû û dilê wê ji her kesî re vekirîbû. Li rex xebata wê ya nava Kongra Star de, gelek kar û çi tişta jê bihate xwestin daye meşandin. Hevaleke fedekar bû. Em weke jin di meş, merasîm û hêmû karan de bi hev re ne û Şehîd Menîce yek ji wan jinan bû”.

**‘Em ê li ser xeta Şehîd Menîce têkoşînê berdewam bikin’**

Endama Kongra Star Ranya Salih axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Şehadeta Şehîd Menîca bandoreke mezin li me kir û bi taybet hevalên wê yên ku pê re kar dikirin. Her wiha em ê heta dawîyê li ser xeta şehîd Menîce berxedan û têkoşînê berdewam bikin, di heman demê de her ku hevaleke me şehîd dikeve moralên me pêhtir xurt dibin. Her wiha ez ê biçim bendava berxwedanê; Bendava Tişrînê û cihê hevala xwe Şehîd Menîca bigirim”.

# ‘Hebûna gelê kurd di pêşeroja Sûriyê de bi hevgirtinê pêkan e’

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

**Endama Komîteya Navendî ya Partiya Pêşverû Dilav Derwêş da zanîn ku divê nêrîna hemû pêkhateyan di Sûriyeya pêşerojê de hebe û desthilatdariya Rejîma Bass careke din xwe dubare neke û got: “Divê gelê Kurd bi hemû hêz û partiyên xwe bibin yek û çarenûsa xwe di pêşeroja Sûriyê de diyar bikin”.**

Rewşa Sûriyê bi giştî di nav gelek guhartin û veguhartinên cidî re derbas dibe. Hilweşîna rejîma Baas û serweriya HTŞ yek ji geşedanên sereke yên vê dawiyê ne. Bê guman gelê Kurd jî ne dûrî wan geşedanan e. Li ser wê bingehê gavên girîng di asta dîplomasî û leşkerî de hatin avêtin. Pêşeroj kî dibe bila bibe, lê îradeya gelê Kurd di destûr û Cografiya Sûriyê de wê neyê tunekirin û di Sûriyeke demokratîk nenavendî de mafê gelê Kurd bê parastin. Li ser wê bingehê gelek danûstandin di yekrêziya Kurdî û gelan de hatin pêşxistin, helbet ev gavên girîng wê bandora xwe li ser hebûna gelê Kurd di Sûriyeya pêşerojê de jî bike. têkildarî rewşa Sûriyê bi giştî, rewşa jin û yekrêziya Kurdî de Endama Komîteya Navendî ya Partiya Pêşverû li Sûriyê Dilav Derwêş nêrînên xwe ji rojnameya me re parve kir.


**`Divê destwerdanên derve li Sûriyê neyên kirin`**

Dilava di destpêkê de bal kişand ser rewşa Sûriyê bi giştî û wiha got: “Sûriyê ji 60 salî ve bi desthilatdariyeke zalimane re dijî. Bê guman em jî, gelê Kurd, perçeyekî vê rewşê bûn ku ji binî ve hebûna me di Sûriyê de nedihat naskirin. Partiyên Kurdî yên destpêkê jî di vî alî de bi veşartî gelek kar dan meşandin, lê desthilatdariya Baas ji desthilatdarên gelên Kurd li perçeyên din ne dûr bû. piştî hilweşîna vê rêjîmê gelê Sûriyê bi giştî kêfxweşiya xwe ji hatine HTŞ’ê re raber kir û weke ku jiyaneke nû ji dest pê kir.

Hikûmeta demkî ger dixwaze bi ser bikeve, aşîtî û ewlehî pêk were, divê destpêkê rê nede destwerdanên ji derve. Mafê ti aliyekî nîne mudexeleyî Sûriyê bike.

Hikûmeta demkî jî divê wisa nêzî pêşeroja Sûriyê bibe, hemû pêkhateyên di Sûriyê de li ser esasê avakirina Sûriyeke demokratîk, pirengî û sîstemeke nenavendî nêz hev bibin û jiyan bikin. Nêrînên hemû aliyan di Sûriyê de bê parastin û qebûlkirin. Ji ber hemû pêkhateyên di Sûriyê de êş, penaberî, kuştin û revandin jiyan kirine. Em jî bi hêvî ne ku di demên pêş de ev yek pêk were”.

**`Di pêşeroja Sûriyê de divê jin xwedî li xwe derkeve`**

Her wiha Dilav bal kişand ser rewşa jinê di Sûriyê de û wiha pê de çû: “Di pêvajoya kirîza Sûriyê de, herî zêde, êş, zehmetî, kiryarên hovane û sûcên şer para jinê bûn. Di heman demê de, jina ku bi şoreşê re bi pêş xistiye, bi rola herî girîng rabûye. Yek ji wan jî jina Kurd bû ku bi pêşengtiya xwe veguherî dengê hemû jinan. Li ser van mîrasan hemû pêkhate rabûn ser xwe û di guhartina zihniyeta hezar salan de xebatên herî girîng û pîroz meşandin.

Rêveberiya HTŞ’ê di Sûriyê de jî divê rengê ku jinê di vê sedsalê de bi destxistiye, tune neke û jin cihê xwe di hemû qadan de bi rengê xwe bigire. Ji ber niha weke rêveberiyekî demkî ye û ji bo mayîndebûna xwe di pêşerojê de kar dike, divê bi hişmendiya nijadperest, olperest û zilamperest dernekeve pêş. Eger weke berê jinê pênase bikin û nêzî wî bibin, wê ti roleke jinê ya diyarker di tayînkirina pêşeroja Sûriyê de nîn be. Lew re jî; çawa xwediya barê herî giran di pêvajoya aliziya Sûriyê de bû, çawa ku li gelek qadên jiyanê şer kiriye û pêşenga avakirina civakê bû, dive ji vir û ê ve jî neheqiyan, bi navên cuda cuda, qebûl neke û xwedî li xwe derkeve”.

**Di yekrêziya Kurdî de gavên binirx hatin avêtin**

Dilav di dawiyê de da zanîn ku hemû tevgerên Kurdî ji bo mafê gelê Kurd tev digerin û wiha got: “Ji ber ku pêvajoyeke guhertin û diyarkirina çarenûsa Sûriyê ye, çavê her kesî li gelê Kurd e. Gelê Kurd jî perçeyek ji Sûriyê ye û divê li ser vê bingehê nêz bibin. Bê guman bûyer û geşedanên di demên pêş de bên jiyankirin wê ne hêsan bin, ji lewre di asta yekem de divê gelê Kurd bi hemû hêza xwe û partiyên xwe bibin yek û çarenûsa xwe di pêşeroja Sûriyê de diyar bikin. helbet me dît ku di van demên dawiyê de gelek gavên girîng û bi nirx di oxira yekrêziya Kurdî de hatin avêtin, gelek nêrînên erênî derketin pêş, hemû jî dikevin xizmeta gelê Kurd di Sûriyê û derveyî Sûriyê de. Hêviya me ew e ku ev pêşveçûn û hevdêtinên ku derketine pêş, bighînin armancên pîroz ji bo serketina îradeya gelê Kurd”.

## Ji Pênûsa Jin

### Rêxistinkirin wê jinê ji qirkirinê biparêz e

Nehîr Pale

Eger jin xwe birêxistin nekin wê nikarbin bibin xwedî helwest û wê her tim rastî qirkirinê werin. Sûriyê piştî hilweşandina sîstema Baasê derbasî pêvajoyeke nû bûye. Li Sûriyê girîngiya rêxistinkirina jinê niha ji berê zêdetir bûye. Zîhniyeta desthilata nû ya Şamê mîna ya berê ye û dibe ku xirabtir be. Ji ber zayendperestî bi hemû şêweyên xwe wê êrîşî jinê bike û hewl bide ku hemû xebatên jinê bide seknandin. Li hemû bajarên Sûriyê yên di bin serweriya desthilata nû de ne komên girêdayî wan e li gorî dilê xwe zagonan li ser jinê ferz dikin.

Bendên kontrolê yên di bin serweriya desthilata Şamê de ne, destpêkirine zextê li jinê dikin. Jinên ku serê xwe nepêçandine şiyar dikin û pirsgirêkan ji wan re derdixin. Li Zanîngehan jî êdî nabe ku jin û mêr bi hevre bixwînin an jî eger li heman zanîngehê bin divê li hevdû necivin, bi hevre nemeşin û şagirtên jin û mêr ji hevdû cûda bin. Desthilata Şamê ya nû wê bi ferasetên zayendperest nêzî jinê bibin. Ew ê daxwazên mîna azadiya jinê yan jî wekheviya di navbera jin û mêr de tine bikin. Şideta mêr a li ser jinê wê rewa bikin, ne zagonî ne jî exlaqî hesab ji mêr naxwazin. Mêrê desthilatdar wê jinê bike sedema hemû pirsgirêkên civakî, êdî wê jin ji berê zêdetir rastî şidetê were.

Jin li tevahiya cîhanê li hemberî zayendperestiyê dest bi têkoşînê kiriye. Her tim di nava lêgerîn û têkoşînê de ye heyanî ku dîroka jinê bi xwe bide nivîsandin. Şerê jinê yê hebûn û rûmetê ye. Li Sûriyê jî ev têkoşîn gihîştiye asta herî bilind. Jin ji aliyê leşkerî ve li hemberî çeteyên DAIŞ, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li ber xwe da û dev ji têkoşîna xwe berneda. Di vê pêvajoyê de jî tê xwestin ku jin li ber xwe bide û dev ji têkoşîna xwe bernede. Teslîmî zayendperestiyê nebe yan jî wê dîsa rastî şikestinê were. Ne tenê jina Kurd pêdiviya wê birêxistin kirinê heye, jina Ereb, Turkmen, Durzî û hwd tenê rêxistinkirin dikare wan ji qirkirinê biparêz e. Jina Sûrî eger dev ji doza xwe berde wê mîna jina Filistînî, Sudanî, Afxanî, Îranî û hwd. lê were. Israîl di şerê xwe yê bi Hemasê re bi sedan komkujî li ser jinê pêk anîn û giştî jinên Filistînî bûn qurbanê vî şerî. Niha jî çarenûsa jinên Filistînî û gelê wê ketiye destê Israîl û Amerîka de. Çawa têkoşîn û berxwedana jinên cîhanê ji aliyê kaptalîzmê ve tê pûç kirin, jina Sûriyê eger xwe birêxistin neke wê bikeve heman rewşê de. Talîban çi bi serê jina Afxanî dike Colanî û gurûpên xwe jî wê heman tiştî bi serê jina Sûrî bikin. Pirsgirêka zayendperestiyê gelekî kûr e û ji bo were çareser kirin, wê têkoşîna jinê di gelek pêvajoyan re derbas bibe. Di hemû pêvajoyan de eger jin xwe birêxistin bike wê bikaribe bi pêşve biçe. Jina Sûrî birêxistinkirinê wê hebûn û rûmeta xwe biparêze û bibe xwedî tecrûbeyeke mezin.



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvana kurd Helîma Can Kobanê Mînaka jina Kurd a berxwedêr û bi israra jinên Kurd di vejîna civakên kevnar û nûjen de roleke sereke lîstine û bi vê rola xwe şiyana xwe ya ji bo pêkanîna guhertinên erênî di nav wan civakan de nîşan dane, hebûna wê ya berbiçav di warên cuda yên jiyanê de û israra wê ya li ser rawestana li kêleka mêran û piştgirîkirina wî, nîşana wê yekê ye ku ew hêmanek bingehîn e di pêkanîna pêvajoya guhertina civakê de. Jinên Kurd di hemû warên wêjeyî, hunerî, çandî û siyasî de hebûna xwe îspat kirine û hin ji wan ji mêran borandine û hebûna xwe di hemû warên jiyanê de îspat kirine, ji bo mafên xwe têkoşiyane, bi korbûna dîrokê re rû bi rû mane û wan berevanîya nêrîna xwe li ber cîhanê kirine, yek ji wan jî helbestvana Kurd Helîma Can jî heye, ku hebûna xwe di cîhana helbest, roman, nivîsandin û stranbêjiyê de, ji bilî cîhana hunerî ya ku dagir kiribû, îspat kiriye û hebûna xwe di cîhana dirûtin û xemilandinê de ferz kiriye .

Tevî zehmetiyên ku rû bi rû li pêşiya wê derketine ji kevneşopiyên civakê, adet û zagonên civaka eşîretî yên serdest li Kobanê û serpêhatiyên tendirustî û pîskolocî (derûnî) yên ku di jiyana xwe de pê re rû bi rû mayî jî, wê karîbû di civaka wêjeyî û çandî de şopeke taybet bihêle û dîsa ji nû ve li ser lingên xwe bisekine.

Ger hûn li nivîsar, helwest û cîhana wê bihizirin, hûn ê bibînin ku ew jina ku xeyal dike û ber bi tiştê tê xwestin ve dimeşe, hemû birînên ku rastî di dilê mirovahiyê de çêdike red dike, ji bo daxwaza azadî, edalet û lêgerîna jiyanê dengê xwe bilind dike.

Helîma Can keça bajarê serhildêr ya Kobanê, sembola berxwedan û serkeftina li dijî terorê, firşikbûye ji kaniyên wê ruhê berxwedanê û ji çavkaniyên wê yên dîrokî û şaristaniya wê ya kevnar, zanist û zanînê vexwariye. Wê biryardarî û hêza xwe ji heybeta Çiyayê Miştenûrê girtiye û ji rûmetdarîyên şêrgelên wê Arîn Mîrkan û Barîn, ruhê afirandêrî û nûjeniyê îlham girtiye. Helbestvan, nivîskar û çalakvana kurd Helîma Can, di roja 22.3.1979’ê de li gundê Xerebal a girêdayî bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê, di nav malbateke kurd a welatparêz, muhafezekar, rewşa wan ya jiyanî nîvane, ji dê û bavên kurd (Mehmûd û Elîfa) hatiye dinya yê.

Ji ber desthilatdariya mêr di civakê de zehmetî kişandine, zarokatiya xwe li gundê xwe derbas kiriye û piştre malbata wê di sala 1984’an de koçî bajarê Kobanê bûye û li wir bi cih bûye. Dibistana seretayî û navîn xwend, lê qonaxa amedayî yê neqedand û ji ber şert û mercên giran ku tê re derbas bû, demekê dev ji xwendinê berda, lê ew bê hêvî nebû ji xwendinê û bi vîna (îradeya) xwe ya xurt karîbû hemû bend û astengan bişkîne da ku nebin asteng li ber xewn û xeyalên wê yên ji bo bidestxistina armancên wê, ji ber vê yekê di sala 2012’an de bawernameya amedayî di beşa wêjeyî de wergirt û piştî wê çû Helebê ji bo qedandina xwendina xwe ya zanîngehê û li wir li kulîjeya Wêjeyê beşa Civaknasiyê li zanîngeha Helebê tomar kir, lê ji ber şert û mercên şer, nekarî xwendina xwe ya zanîngehê biqedîne û piştî vekirina zanîngehan li Rojava, du salan li Amûjgeha Zimanê Kurdî ya Mamosteyan û rêbaza xwendinê li bajarê Kobanê xwend, piştî derçûna xwe wek mamostetiya zimanê kurdî, mamostetiya şagirtên dibistana seretayî ya pola duyemîn kir.

Di encama dorpêçkirina bajarê Kobanê ji aliyê DAIŞ’ê ve di sala 2014’an de, û piştî bûyerên xwînrêj û şerê li bajarê Kobanê û derdora wê rû didin, û wêrankirina piraniya ji bajêr, û di encama şert û mercên jiyanê yên dijwar, neçar ma ku bajarê xwe û hevalên xwe biterikîne û koçî Tirkiyeyê bibe.


Meyla xwe ya hunerî ya ji bo stranbêjiyê ji zarokatiya xwe de dest pê kiriye, dema ku di dibistana seretayî de bû stranên Şivan Perwer û Koma Berxwedan digotin û bi stranên wan ên şoreşgerî û welatparêzî mezin bû,lê dema ew mezin bû, malbata wê nehişt ku ew stranbêjiyê bike, ji ber ku ji bo wan şerm bû ku keçek li gorî bawerî û ramanên wan û li gorî adetên civaka Kobanê bistirîne.

Xebata xwe ya wêjeyî û çandî dest pêkir piştî şerê Kobanê û koçkirina xelkê wê ji bo welatên biyanî, dûrî malbat û welat, ku hesret û bêrîkirina wan ji bona axa welat û hezkiriyên wê ve dikişîne, êş û xembariya wê vediguhere afrîneriyê di danîna helbest û gotaran de. Helbestvan Helîma Can bi çar zimanan dipeyîve: Kurdî, Erebî, Îngilîzî û Tirkî û gelek hinêrên (mewhîbe) wê hene wek:(stran, mûzîk, dirûtin û xemilandin).

Bi zimanên Kurdî û Erebî helbest û gotaran dinivîse û di nivîsên xwe de êş û azariyên gelê Kurd, derdên xerîbiyê û hesreta welêt di vê qonaxa niha de dest nîşan dike herweha, ew li ser jînenîgariya hunermend û helbestvanên kurd jî dinivîse.

Helbestvan û nivîskara kurd Helîma Can du dîwanên helbestan nivîsandine:

1-Dîwana yekem a bi zimanê kurdî ji 73 helbestên di navbera helbestên pexşan û kilasîkan de pêk tê û tê de helbestên welatparêzî û romantîk hene.



2-Dîwana duyem a bi erebî ji 125 helbestên pexşan pêk tê.

Ji bilî amadekirina pirtûkek ji gotinên pêşiyan ên kurdî ku ji 600 gotinên pêşiyan û pendan pêk tê ji amadekirin û wergerandina wê ji bo zimanê Erebî.

Niha jî amadekariya pirtûkekê dike ku ji berhevoka çîrokên kevn û kurteçîrokên girêdayî çanda civaka Kobanî pêk tê. Ji ber şert û mercên dijwar ên penaberî, koçberî û xerîbiyê di hemû waran de, şert û mercan alîkariya wê nekir ku berhemên xwe yên wêjeyî(edebî) çap bike û belav bike, hemû jî li benda derfeteke guncawin ji bo çapkirinê. Gelek helbestên wê di malper û kovarên edebî de hatin weşandin û gelek bawernameyên pesindayîn û afirandêriyê wergirtine.

Piştî bûyerên bixwîn ên sala 2014’an, ji bajarê xwe yê birîndar Kobanê derdikeve û li bajarê Rihayê yê Bakurê Kurdistanê li gel birayê xwe yê mezin bi cî dibe, ji ber rûmetdariya xwe, xwe dispêre xwe û alîkariya malbata xwe jî qebûl nake, ji bo birêvebirina debara jiyana xwe û pêdiviyên jîyanî di kargeheke dirûtinê de dixebite, di dawiya meha Tîrmehê ya sala 2024’an de bajarê Rihayê terikand û berê xwe da Ewropayê û di 25.08.2024’an de li bajarê Elmanya Münsterê bi cih dibe.


Ew di xewn û xeyalan de ye û bêsebir li benda vegera welatê xwe dimîne ku di demek zû de vegere û di hembêza wê de û di hembêza bajarê xwe Kobanî de bijî.

Helîma Can helbestvaneke hêja ye ku helbestên wê bi hesteke bilind û afirandêriyeke mezin ve girêdayî ne û jêhatiya afirandêriyê ber bi asoyên ku sînoran nas nakin ve diçe.

Jiyanek birûmet û tijî şahî, bextewarî, pêşkeftin û afirîneriyeke zêdetir û vegera li hembêza Kobanê bo wê dixwazim.



## Têbînî



### Li hember gotara nefretê .. rola rewşenbîran

Kemal Necim

Li seranserî dîoka xwe ya kev û nû, Kurd ji hêla netew û desthilatdaran ve rastî gelek şêweyên çewisandinê hatine, her wiha rastî gelek awayên qirkirina çandî û fîzîkî hatine. Lê dibe ku tu caran bi qasî van demên dawiyê rastî gotara kîn û nefretê nehatibin.

Di pêvajoya 14 salên aloziya Sûriyeyê, ji ber ku gelê Kurd li Rojava rêya xwe ya cuda hilbijart û tevî arîşe û pevçûnên aliyên dijberî hev nebûn, ji her du aliyan ve rastî gelek êrişan hatin. Lê tişta sosret ew e ku piştî rûxandina rejîma Baas, gelek derdorên ku qaşo xwe şoreşger, dijber, pêşverû û demoqrat binav dikirin, niha bi her şêweyên nîjadperestî, paşverû û kevneperest gotara kîn û nefretê li dijî Kurdan ji devê wan dibare. Her roj bi sedan kes, malper û dezgehên ragihandinê ku bi awayekî ji awayan nêzî desthilata li Şamê ne, gotara nefretê lidijî gelê Kurd bi awayekî sîstematîk bi rêve didin.

Li gorî hin danasînan gotara nefretê ew şêweyên derbirînê yên ku cudakarî yan dijminatiya li dijî kesek an komekê belav dikin, pêş dixin û rewa dikin. Yan jî bangên nefret, cihêkarî, neyartî, tundî û êrîşkariyê li dijî kesên xwedî hin taybetmendiyên cuda, wek nijad, ol an kêmendam, yan xwedî nêrînên siyasî yên cuda, reng, zayend yan jî çi faktorek din a nasnameyê.

Her wiha her axaftineke ku banga ziyandayînê dike ew gotara nefretê ye. Gotara nefretê dibe sedem ku aliyek li dijî aliyê din tê sorkirin, lewma ew kiryareke pir tirsnak e, bi taybet dema ku bi awayekî sîstematîk bi piştgiriya medyayê tê kirin.

Helbet pir sedemên gotara nefretê hene, lê bi giştî hişmendiya kevneperest û paşverû ya netewperestî, nîjadpesertî, zayendpereseti û tundrewiya olî, sedemê sereke ne. Civakên xwediyên van hişmendiyan zû nikarin civakên din û netewên din, nîjadên din, zayendên din û olên din bipejirîne û her tim wan weke dijmin dibîne û dixwaze wan biçewisîne yan tune bike. Lê di rewşên siyasî de carê hin desthilatdar xwe dispêrin van hişmendiyan û ji bo parastina desthilata xwe her tim hewil didin gotara kîn û nefretê di nava civakan de gur bikin. Em vegerin ser mijara gotara nefretê ya ku ji hêla civakeke diyar ve li dijî civaka Kurdan a li Rojava tê birêve birin, gelo mirov çawa dikare rê li pêşiya encamên pir xerab yên vê gotarê bigire.

Metirsiyek heye ku (kîn kînê bikşîne), angu civaka Kurdan jî hewil bide ku bi nefretê bersiva nefretê bide, bi kînê bersiva kînê bide, lê di encamê de dê rewşên pir xerab derkevin holê û dê derz û şikestina di navbera civakan de hîn kûrtir bibe û dibe ku veguhere şer û pevçûnên navxweyî.

lê reftar û kiryara saxlem û durist ew e ku çîna rewşenbîr, bîrewer û kesayetên civakî, bi hişmendiyê hemdem ên hevdû pejirandin, lihevhatin, hezkirin, lêborîn, jiyana hevbeş û biratiyê, tevbigerin. Divê çîna rewşenbîr derfetên diyaloga di navbera çand û nasnameyên cuda de fireh bike ku civak hevdû nas bikin, baweriyê bi hev bînin û egerên dijberî û nakokiyan di nava civakan de kêm bikin.

# ‘Serxistina doza Hevrîn parastina mafê jinên cîhanê tevahî ye’

Sûad Mistefa dayika siyasetmedara kurd û sekretêra Giştî yê Partiya Sûriya Pêşerojê şehîd Hevrîn Xelef, diyar kir ku cihê kujêrên keça wê dadgehe, ne li parlemantoya Sûriyê ye û wiha got: “Ez kujerên keça xwe ti caran weke nûnerên xwe nabînim.”

**Amara Baran/Qamişlo**




Di konfernsa ku qaşo bi navê ‘Konferansa Serkeftinê ’ li Şamê hat lidarxistin, serçeteyê koma Ehrar El-Şerqiye Hatim Ebû Şeqra (Ehmed Îhsan Feyad El Hayîs) yê ku Sekretera Giştî ya Partiya Sûriyeya Pêşerojê Hevrîn Xelef qetil kiribû, beşdar bû. Di wê konfrensê de nûnerên Rêveberiya Xweser û Kurdan tinebûn. Bi gumane ku rêveberiya demkî ya nû a Sûriyê dikare bi wê hişmendiya tundrew ji bona gelên herêmê bibe bersiv? Di derbarê Konfrensa Serkeftinê a li paytexta Sûriyê Şamê hatibû lidarxistin de, tevlîbûna kujerê bi navê Ebû Şeqra yên qetilkirina Sekreterya ya partiya Pêşerojê Hevrîn Xelef te cih girtibû, dayika Hevrîn ji rojnameye me re axivî.

**‘Hevrîn pir ked ji bona avakirina pergala biratiya gelan da û bidestê dagirkeran şehîd bû’**

Dayika şehîd Hevrîn Xelef Sûad Mistefa da diyarkirin ku keda keça wê ti caran nayê birkirin û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di destpêkê de, şehîd Hevrîn û şehîdên şoreşa Rojavayê Kurdistanê hemûyan bibîrtînim û bejna li ber wan ditewînim. Ev şehîdên pêşeroja Sûriyê ne. Hevrîn keça min bû, di heman demê de, mamosteya min a jiyanê bû. Raste ez dayika wê me, lê ev mamosteya min bû. Hevrîn beşa zanîngehê ya endezyariya avahsazî û wêjeya Ingilîzî xwendibû. Ji hemû aliyên jîyanî de jî, xwe pêş xisti bû. Piştî şoreşa Rojava zimanê Kurdî bû zimanê perwerdehîyê, bawernameya zimanê Kurdî jî wergirti bû. Di aliyê xebatên mafê mirovan jî xwe perwerde kiribû. Ji bona pêşxistina rojnamevantiyê saziyek avakir binavê Nûrî Dersimî. Di aliyê herkesê dihat hezkirin û di dilê civakê de cihekî girîng hebû. Rojev dişopand û rojevê re dibû bersiv. Pir bi zanebûn hate armanckirin û qetilkirin. Ji ber agahiya herkesê pê hebû ku Hevrîn jineke tekoşer û serhilder e. Bi destê dagirkeran em û pêkhateyên ku wê derê jiyan dikin taybet gelê Ereb re kirin dijminên hev. Lê Hevrînê ev kiryar ne pejirandin û got em birayê hevin, wê bi ramanên Rêber Apo xwend û ev kir felsefeya jiyana xwe. Ev pêkanîn jî ne hêsan bû. Mejiyên ku bi dijmintiyê hatibûn avakirin guhertina wî mejî û hişmendî ne hêsan bû. Hevrîn jiyana xwe di oxira pêşxistina felsefeya Rêber Apo de, da. Li gor zagonên navnetewî û cîhanî jî, siyasetmedar, aktivîst û parazvanên mafên mirovan dikarin xwe bighînîn herderê ku kiryarên dervî mirovî tê de dimeşin. Hevrîn Xelef jî ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk yên li ser bajarê Serêkaniyê û Girêspî hewilda bişopîne û xwe bigîne wê derê. Lê bi desten çeteyêm dagirker hat qetilkirin. Taybet jî li ser riya Reqa hat şehîdxistin. Ev darbeyekî ji bona pêşxistina biratiya gelê Ereb û Kurdan bû.”

**‘Heya kujer bên darizandin em ê berxwe bidin’**

Yadê Sûad bibîrxist ku kujerên Hevrîn Xelef di asta navnetewî de pêwiste bên darizandin, kongreya ku kujerên Hevrîn Xelef tevlî bibû şermezar kir û axaftina xwe wiha domand: “Ez weke dayika şehîd Hevrîn û şopdara riya hemû şehîdane, em ê tola wan li erdê nahêlin. Ev tê zanîn ku berî niha çend rojan kongreyek ji bona diyarkirina pêşeroja Sûriyê hat ragihandin. Ebû Mihemed El Colanî (Ehmed El Şera) weke serokkomarê demkî yê Sûriyê hat diyarkirin. Kûjerên Hevrîn jî yê bi navê Hatim Ebû Şeqra (Ehmed Îhsan Feyad El Hayis ) jî cih girtin û wê kongrede jî nûnerên Rêveberiya Xweser tine bûn. Ev tê wê wateyê ku Kurd di Sûriyê nûve bê avakirin de, bê maf bên hiştin. Em weke kurd, ti caran biryarên wê kongre de napejirînin, ger ku em bipejirînin ev tê wateya ku em kujerên Hevrîn û pêşengên civakê, jinên din hatine qetilkirin di pejirînin. Ev kongre kongreya dagirkera ye û ne yên mafên gelên Sûriyê naparêzin. Ez weke dayika Hevrîn Xelef jî dibejim riya Hevrîn Xelef rêya pêkanîn xeyalên zarokê Kurdistanê tevahî bû. Ji bona wê yekê em ê xeyalên zarokên Kurdistanê nîvço nehêlin. Em ji bona kujerên Hevrîn bên darizandin serlidana gelek saziyên mafên mirovan kir, lê bêbersiv hat hiştin. Edelet tenê kiraseke ku hatiye pêkirin lê, rastiyê de tine ye. Li Ewropa bajarê Swîsre konfransek hat çêkirin, ji bona kujerên Hevrîn Xelef bên darizandin birayê wê amade bû. Di encama wê konferansê de hat gotin ku Hevrîn hatiye qetilkirin ev weke fermî jî birayê wê re hat ragihandin. Ji ber ku ev qetlîamên wisa derveyî mafê mirovan e. Heya dawiya temenê xwe jî ez ê bendê bêm ku kujerên keça min bê darizandin. 24’ê meha Sibatê li li welatê Italya doza Hevrîn Xelef dê pêk bê û me bi riya whatsabê parêzerek girt. Ev jî jin bû me hevî lê kir ku mafên hemû jinan bê parastin, doza Hevrîn doza serxistina mafên jinane. Ji ber ku dagirkeriya Tirk ne tene li ser jinên Kurd, li ser jinên cîhanê tevahî zextê dide meşandin.”



**‘Ji bona meşandina şoreşgeriya Hevrîn Xelef navê gelek zarokan bû Hevrîn’**

Yadê Sûad got ku ew weke malbata Hevrîn ti caran riya keça xwe venagerin û wiha axaftina xwe qedand: “Gelek malbatan piştî şahadeta Hevrîn Xelef navên zarokên xwe kirin Hevrîn. Dema rojekê ev nifş mezin bûn û wateya navê wan hate pirsîn dê bêjin “Hevrîn nîşaneyeke wateya serkeftin û şoreşgerîyê ye.” Hevrînên ku dê bibin, sîyasetmedar, parêzer û leşker dê mafê Hevrîna min li erdê nehêlin. Ji ber ku jinên Kurd bûne mînak ji bona şoreşa jinên cîhanê. Ji ber ku pêşengên wan jinan jî Sara, Rojbîn, Ronahî û yên weke Evîn û Hevrîn Xelefin. Sema, Zîlan û Zekiye neban em jî niha tine bibûn. Em dîsa dibêjin em pey doza Hevrînê ne, ji ber ku em dikarin birçî bimînin, lê em nikarin bêrûmet jiyan bikin. Rûmeta me ax û welatê meye, şopandina Doza Hevrîn Xelefa û azadiya fizîkî ya Rêber Apo ye. Em weke jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti cara kujerên jinên Kurd weke nûnerên xwe na pejirînin. Em dîsa dubare şermezar dikin ev kongreya kujerên jinan û biryarên li wirde bi giştî red dikin.”

**Xwenasîn**



**Komunalîzma Demokratîk**

Rohat Bulut

Rêxistinbûna rêveberiya neteweya demokratîk ne dewlet, komunalîzma demokratîk e. Ji bo komunalîzma demokratîk rêxistinbûna hemû civakê di asta bingehîn de pêwîst e. Demokrasî bi hemû saziyên xwe yên di nava gel de dibe yek û wekî goşt û hestî bi hev bikelije. Îro dema em berê xwe didin Rojavayê Kurdistanê bi hêsanî em dibînin ku gel ji gundan bigire heta li tax, bajarok, navçe û bajaran bûne xwedî rêxistinên xwerêveberiyê. Di warê siyasî, civakî, çandî, aborî, tenduristî, perwerdehî û hwd. Pirsgirêkên xwe bi alîkariya vê rêxistinê çareser dike. Niha ber bi pergaleke demokrasiya rasterast ve diçe, ku bi rastî ji binyada xwe kar dike, ku li wir siyaset û polîtîka bi cih tê û her weha bandora xwe li herêmê dike. Ev pergal ji bo hemû gelan dibe mînak.

Dema em bala xwe didin rejîm, dewlet û rêveberiyên ne demokratîk di pergalên ku avakirine de bi tu awayî mafên gel û civakan ên xwe rêvebirin û biryardayîna derbarê çarenûsa xwe de tune ye. Di serî de têkoşîna gelê Kurd a bi salan ji bo hilweşandina vê hişmendî û ferasetê bû. Ev têkoşîn jî li Rojava jiyanî bû. Gel bi rêveberiyên xwe, bi pergala xwe ya demokratîk û bi hemû mafên xwe yên mirovî dijî. Li ser bingeha jiyana wekhev, demokratîk, û komunal civakabûyîna xwe saz dike û têkoşîna xwe dide. Di civakê de komun û demokrasî gelek girîng e. Lewere ev dibe jiyan û parastina mafên her mirovên ku ferdê wê civakê. Bi mijara me ve eleqedar em dixwazin hinekî li ser Komunalîzma Demokratîk dakevin. Yek ji prensîbên herî girîng ên Komunalîzma Demokratîk veqetandina pêvajoyên biryargirtinê û pêkanînan e. Dema ku biryar ji aliyê meclîsên gel û komunan ve tê girtin, pêkanîna biryaran jî bi koordînasyonên demokratîk ên wekî saziyên rêveberiyê pêk tên.

Bi vê ve em dibînin ku serdema keyfî ya rejîm û serdestiyê li ser gel diqede. Di rêveberiyên demokratîk de dafê hilbijêran heye ku çavdêriya rêveberiya xwe bikin û dema ku hewce bike jî paşve vegerînin. Lê di rejîm û desthilatiyan de ev tune ye.

Di Komunalîzma Demokratîk de komun û meclisên gel dibin rêxistinên girîng ên civakî. Her wiha şaredarî bi gelek avantajên xwe berê xwe bidin qadên birêxistinkirina jiyana demokratîk-komunal. Ji demên kevnar ve, rêveberiyên herêmî yek ji herêmên pêşeng in ku netewe û gel bi xwezayê re û li ser bingeha hilberîna xwe ya aborî bi hev re dijîn. Îro dema em berê xwe didin Rojava, em dibînin ku rêveberiyên xwecihî û yên xweser di roja me ya îro de cardin heman rista xwe ya dîrokî dilîzin.

Em dibînin ku bi salan e ku berê her kesî li Rojava ye. Pergala Xweseriya Demokratîk ji bo hemû beşên civakê hêviya jiyanê ye. Lewre her kes xwe di nav vê pergalê de dibîne û bi mafê xwe yên bingehîn dijîn. Bi meclis û komunên xwe wekhev dijîn. Ev ji bo hemû mirovahiyê pêwistiyeke jiyanî ye. Lewere jî pêwîste hemû mirovahî ji bo parastina nirxên mirovî yên bingehîn xwedî li pergala Rojava derbikeve. Pêwîste hemû demokrat, sosyalîst û komunîstên cîhanî xwedî li Rojava û civaka ku van nirxên mirovî diparêzin derbikevin. Divê her kes xwedî li rêxistinbûna rêveberiya neteweya demokratîk ango komunalîzma demokratîk xwedî derbikeve.



# ‘Rêveberiya Xweser ji bo cîhanê tevahî modêla çareseriyê ye’

Dîrektora Lêkolînan ya Enstîtoya Aşitiyê ya Kurdî Meghan Bodette da diyarkirin ku gelê Kurd ne tenê di heremê de, pêwîste di cîhanê giştî de were naskirin û wiha got: “Têkoşîna gelê kurd ji bona hemû gelan bûye mînaka berxwedanê”

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Meghan Bodette jinekî Emerîkî ye û zanîngeha GeorgeTown Universty a eyaleta Wasihingtonê beşa peywendiyên navnetewî derçû ye. Ji ber beşa wê ya zanîngehê re têkildare lekolîn li ser gelên ku mafên van bi destê hêzên hegemon û desthiladar hatine girtin kiriye. Ji ber wê sedemê têkoşîn û dîroka gelê Kurd nasbike di sala 2021’an de derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibe. Li ser berxwedana gelê kurd gelek analîz û nivîs nîvîsandine, ji bona civaka Emerîkî û Ewropa jî gelê Kurd ji nêz ve nasbik e.

Derbarê danasîna şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê û civaka Kurd di asta navnetewî de, Dîrektora Lêkolîn a Enstitûya Aşitiyê ya Kurdî Meghan Bodette ji rojnameya me re axivî.

**‘ Hatina min ya Rojavayê Kurdistanê bi armanca dîtîn û lêkolînkirina têkoşina gelê Kurd e’**

Meghan Bodette anî ser ziman ku şoreşa Rojavayê Kurdistanê modêla pêşengiya jinê û rêveberiyê ya li tu deverên cîhanê ne hatiye dîtîn e û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di sala 2021’an de ez derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûm. Ez nû li Emerîka zanîngehê ji beşa analîz û lêkolînê derçû bûm. Min hezdikir ku şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi çavê xwe bibînim û di heman demê de jî, bikarim di kar û xebata xwe de pêş bikevim. Ji bona bikarim di aliyê pîşeyî de ezmûnek baş bidest bixim hatim li Rojavayê Kurdistan ê. Ji ber ku civakekî ku rastiya şer û pergalê ji hevdû derbixe, tenê bi dîtin û guhdarkirina şahîdê bûyerê hin tişt ji hevdû bikare derbêxe. Li ser vê mijarê saziya ku ez xebatkarê wê me, min jêre pêşniyar kir ji bona ku em şoreşa Rojava û deskeftiyên kurdan û pêkhateyên herêmê bibînin û lêkolîn bikin. Ev hatina me ya Rojavayê Kurdistanê bandoreke mezin li ser karê me da avakirin. Gel û pêkhateyên cuda yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, pergaleke hevpar ya her baweriyê digire nav xwe de û di heman demê de jî bi pêşengiya jinê bi jinê re jiyanekî nû dide avakirin. Ji ber ku



li ti aliyên cîhanê jinê jiyana xwe ne hilbijartiye û dîroka jînê jî di destê zilam de hatiye nivîsandin. Ev modêla heyî di cîhanê de kêm weke wê tê dayîn û em dikarin bêjin weke wê modêlê jî qet nîn e. Pirsgirêkên civakê û taybet yê jinê pirbûn û modêlek wisa avakirin jî bala herkesê dikişand. Qeyranên aborî, pirsgirêkên ekolojî herderê cîhanê tê rast dîtin. Ji ber ku ev pergala têkçuyi ya netewperest û otorîter ya Sûriyê ya kevin û niha gelek welatên din jî wisa tên rêvebirin ji van qeyran û alozîyan re nabin û nikarin çareseriyê pêkbînin. Ji ber ku ev pirsgirêk gerdûnî ne, rêveberiyên navendî û hişmendiya dewlet netew nikare pirsgirêkên civakê biqedîne. Ev modêla Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê nenavendîy e, û modêla hemû pêkhateyên Sûriyê û keda gel ya hevpare. Piştî têkçûyina rejîma Baas’ê jî, ev zêdetir dikeve rojevê ku ji bona tevahî Sûriyê bibe modêla rêvebirinê. Ji wan ezmûnên hatine girtin ev pergal dikare di Rojhilata Navîn giştî de bibe hêza sereke ya çareseriyê. Ji ber vê yekê hêviya min û welatê min ewe û ez jî ji wan ezmûnan sûd werbigrim û lêkolînekê girêdayî berxwedan û têkoşîna gelê kurd bikim hatim li Rojavayê Kurdistan ê. Min ev encam ji hatina xwe ya Rojavayê Kurdistanê derxist ku heger bîr û bawerî hebe, dawîya her zor û zehmetiyê serkeftine.”

**‘Gelê Kurd gelekê berxwedêr e’**

Meghan Bodette diyar kir ku têkoşîna gelê Kurd û Kurdistanê herderê li cîhanê bûye destan û wiha axaftina xwe domand: “Min dema zanîngeh dixwend, ji ber beşa min ya zanîngehê bi wê ve eleqedar bû, min dîroka gelên cîhanê yên berxwedêr dişopand. Ev tûndî û zextên li ser gelê Kurd tê meşandin û di heman demê de jî, têkoşîn û qehremaniya gelê Kurd pir bala min kişand. Li



Emerîka eyaleta Washington min hin kesayetên Kurd naskirin. Piştre min meyzekir çi derfet hene û ez bikarim bikar bînim? Piştre min dîroka serhildanên Kurdan lêkolîn kir û min berxwedaniya wan naskir. Di sala 2016’an dema êrişên çeteyên DAIŞ’ê li ser Rojavayê Kurdistanê dimeşiyan, min ev mijar baş fêm kir ku gelê Kurd ne tenê ji bona civaka kurd aşitî û çareseriyê dixwaze, di heman demê de jî, xwasteka van ya aşitiyê gerdûnî û cîhanî ye. Beriya şoreşa Rojavayê Kurdistanê, dewletên navnevî û hegemon mêzekerina van ya ji gelê Kurd û pirsgirika gelê Kurd ne neyinî bû. DYA berê dewleta Tirk ya dagirker çiqasî êrişî kurdan dikir xwe bêdeng dihişt û di heman demê de êrîşên li ser gelê kurd rewa didît. Min dema zanîngeh qedand min heznedikir ku ez ji bo taybet navend û kesayetan kar bikim. Min hez dikir ez têkoşîna gelan bidim parvekirin û hemû cîhan gelên berxwedêr nasbikin. Di sala 2017’an de Erdogan derbasî Emerîka bû. Ji bona peywendiyên navnetewî û peywendîyên di navbera DYA û Tirkan da qaşo hatibû komxebatekê bide xwandekarên zanîngeha Emerîka. Ji ber ku ciwanên Kurd yên ku li Washinghtonê jiyan dikirin, xwepêşandan dijî Erdogan pêkanîn zext û işkence di aliyê zêrevanên Erdogan ve, li hemberî van ciwanan hatin kirin. Min wê demê naskir ku di Tirkiyê de, mafê ti pêkhateyan re nîne û di heman demê de kurd li herderê rastî tûndiyê û qirkirinê tên. Ger ku di axa welatekê din tu li hemberî civakê tûndiyê pêktîne wê demê di axa bin serweriya te de birehetî qirkirinê dikare bimeşîn e. Ji ber van bûyer û sedeman min ji bona lêkolînkirina mafê Kurdan û têkoşîna hemberî gelê Kurd xebat dan destpê kirin. Ev yek hat xuyakirin ku dîroka gelê Kurd û Kurdistanê tev serhildêrî û berxwedaniyê ye.”

**‘Xebatên me yên ji bona danasîna civaka gelê Kurd, li Emerîka jî bidom e’**

Meghan Bodette da bibîrxistin ku xebatên danasîna Kurdan dê bidomînin û got: “Hîn aktîvestên Emerîkî hene birastî jî, derheqê demografiya Emerîkî jî zêde ne agahdarin. Lê wê baş agahdarbin ku Kurd doza heqiyê dimeşînin û kurd pêwîste mafên xwe yên bingehîn bidest bixin. Baş dizanin ku Başûr û Rojavayê welat gelê Kurd û DAIŞ’ê têkbirin. Kurd hevkarê hevpeymana navdewletî yên dijî DAIŞ’ê bûn. Ne ji kurdanba çeteyên DAIŞ’ê yên hov têk ne diçûn. Kurd yêkîtiya herêmê giştî diparêzin û bîrdozîya wan yên herêmê cûdatir e. Cîhan giştî agahdare ku ev rejîmên ku li her çar parçeyên Kurdistanê dagirkirine rejîmên otorîterin. Gelek caran civaka emerîkî wê pirsê dikin û dibêjin “Em çima piştgriya xwe ya ji bona gelê kurd zêdetir nakin?” Ne razîbûna xwe ya ji bona di nav peywendiyên di navbera hikûmeta DYA û AKP-MHP’ê tînîn li ser ziman. Niqaşên me herdem ji bona piştgrî zêde kirina gelên Rojhilata Navîn û yên cîhanê yên azadî xwazin. Pêşniyara min ji bona saziyên navnetewî û ragihandinê zêdetir bikin û werin şoreş û berxwedana gelên berxwedêr li ser erdê bibînin. Ji ber ku dema tên naskirin baş tê fêmkirin. Em jî dê zêdetir xebatên xwe yên danasîna gelê Kurd zêdetir bikin.”

**‘Ji bona çareseriyeke mayinde, divê civaka navdewletî guh bidin pirsgirêkên gel’**

Meghan herî dawîyê anî ser ziman ku ji bona pirsgirêkên herêmê çareser bibin, divê piştgirîya navnetewî zêde bibe û axaftina xwe wisa qedand: “Pêwiste civaka navnetewî piştgiriya xwe bide Rojavayê Kurdistanê. Ji ber pêkhateyên herêmê mafê wan divê were parastin û bên piştgirî kirin. Bê ku bê navendî kirin, pêwîste xweseriya wê herêmê di asta navnetewî de biparêz e. Ev hatiye teqez kirin ku êrişên dewleta Tirk ya dagirker dagirkeriye û pêwîste êrişên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bide sekinandin. Bê ku êriş werin rawestandin ne gengaze ku çareseriya siyasî li seranserî Sûriyê pêkwere. Ev daxwaz daxwaza hemû aliyên Sûrîyê ne ku bi riya çareserî û goftûgoyan ancax êrîş bêne seknandin. Pêwîste li her çar parçeyên Kurdistanê mafên gelên kurd bên parastin û civaka navnetewî pêwîste bêdeng nemînin. Pêwîste di asta navnetewî de zext bê kirin ku êrişên li ser her çar parçeyên Kurdistanê bê sekinandin. Ev jî bi xebat û karên me ve girêdayi ye.”

# Bi qirkirinê aşitî pêk nayê

Endamê Konseya Rêvebir a KCK'ê Zubeyir Aydar anî ser ziman ku hewildanên Rêber Apo xuleya dawî ya aşitî û çareserîyê ye û wiha got: "Ev hevdîtin destpêkekî nû ye, pêwîste aliyên peywendîdar cidî nêz bibin."

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Di derbarê hevdîtin û danûsitandinên li gel Rêberê gelê Kurd Rêber Apo tê kirin û bandora van hevdîtinan li ser asta Kurdistanî û cîhanî, Endamê Konseya Rêvebir a KCK'ê Zubeyir Aydar pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**Di encama pêngava ji bo azadiya fizikî ya Rêber Apo û keda gel a bêhempa hate meşandin hevdîtinek bi Rêber Apo re hat kirin. Giringiya van rêze hevdîtinan mirov çawa dikare binirxîne?**

Di komploya navnetewî û heya roja me ya îro tecrîdeke mezin li ser Rêberê gelan Rêber Apo tê meşandin. Di salên 2000'an û şûn de jî ev zext, izalasyon hat girankirin û hevdîtinên Rêber Apo yên gel malbat û parêzeran bi awayekî keyfî hat sekinandin. Bê wê rewşê gelê Kurd û hevalbendên vê nerehet bûn. Li ser vî bingehî gele Kurd û derdorên azadîxwaz pêngavekî ji bo azadiya Rêber Apo ketin di nav hewildanan û çalakî dan destpêkirin. Di çarçoveya dirûşmeya ji Rêber Apo re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareserî di Cotmeha 2023'an kampanya hat destpêkirin. Pêngavekî berfireh bû û bi rastî jî di raya giştî û navnetewî de jî dengekî xurt da. Ev tenê ne têkoşîna gelê Kurd bû, di heman demê de gelên enternasyonalîst jî ji bona azadiya Rêber Apo bûn yek deng. Li her çar parçeyên Kurdistanê jî, encama xebatên ku dihatin kirin de destê Rêber Apo hat xurtkirin. Serkeftina hilbijartinên li Bakurê Kurdistanê, parastina xaka Rojavayê Kurdistanê û di heman demê de, têkoşîna li hemberî gerilayên azadiya Kurdistaê ya bêhempa de weke sedema hevdîtinên li gel Rêber Apo hat kirin, mirov dikare binirxîne. Ev xebat û têkoşîna gelan û tevgerê, hikûmeta AKP-MHP'ê mecbûr kirin ku li gel Rêber Apo hevdîtin bên kirin. Serdemekî nû jî destpêkir li



Rojhilata Navîn û bitaybet jî li Kurdistan ê. Destpêkê weke li ser navê malbata Rêber Apo, biraziyê wî û parlementerê DEM Partîyê Omer Ocalan hevdîtin li gel Rêber Abdullah Ocalan pêkanî. Peyama wê hevdîtinê pêşket jî, ji raya giştî jî re hate eşkere û parve kirin. Rêber Apo silavên serkeftinê bi rêya Omer Ocalan ji gel û Tevgera Azadiyê re şand. Dîsa 28'ê Berfanbara 2024'an jî desteya bi parlementerên DEM Partiyê Sirri Sûreyya Onder û Perwîn Buldan pêktên çûn Îmraliyê û hevditînek din li gel Rêber Apo pêkanîn. Piştî 4 salan dema destpêkê şandeyekî wisa hevdîtin li gel Rêber Apo pêkanî. Girîngiya hevdîtina desteya DEM Partiyê ji aliyê din ve jî peyama Rêber Apo ya azadî û wekheviyê bû. Ev peyam gelê Kurd yê welatparêz û hevalbendên wî de, hêvî û coşek mezin dan avakirin. Ev serkeftina têkoşîna gelê Kurd bû. Dewleta Tirk a dagirker ti caran ji bona pirsgirêka Kurd, bê berjewendî gav ne avêtiye û navêje jî. Ji zagonan bigire heya hevdîtinekê xwezayi ya bi malbatê re bi bingeha berjewendiyan pêktîne. Ger niha dewleta Tirk ya dagirker diçe Îmraliyê, ev yek bi saya berxwedana Rêber Apo ya 25 salan û têkoşîna gelê Kurd e. Ev pêvajoya ku nû hate destpêkirin ger erênî bimeşe, wê şerê ku li herêmê tê meşandin bi dawî bibe. Tevgera Azadiyê xurte, cîhan giştî jî hesabên xwe yên nû nikarin bê kurdan pêkbînin. Ji ber ku ev alûzî bi dawî bibe hikûmeta AKP-MHP'ê baş dizanin û di encamê de ev hevdîtin hat pêkanîn. Ev serkeftineke mezin û destpêkekî nû ye.

**Naveroka hevdîtina bi Rêber Apo re hatiye kirin, pêwîste çawe were dest girtin û nirxandin?**

Rêber Apo di wan hevdîtinan de balê dikişîne ser xalekî hevpar û pir girîng û di hevdîtinên 2014'an de ji paraznameyên xwere jî wiha dibêje "Ger cidî nêzikatiyek ya herdû aliyên muxatap hebe, ez dikarim wê pirsgirêkê demildest çareser bikim, ji jêrzemînekî tûndî û aloziyan derbasî demokrasî û zagonî bikim. Ew hêza min ya teorî jî pratîk jî hey e." Ev xalên Rêber Apo anîye ser ziman ne gotin û hişyariyên kevnarin. Rêber Apo ev perspektîfên wiha hertim dide raya giştî. Rêber Apo ev bi gelek caran bi rêya peyamên xwe yê bi rêya parêzer û malbata xwe dişand, di heman demê de di paraznameyên xwe de jî, hertim ev hişyarîyên wisa bibîrdixistin. Pêwîste herdû aliyên muxatab van gotinên Rêber Apo baş nas bikin. Ji ber ku her peyameke Rêber Apo ji bona sekinandina şer û alozîya li Rojhilatê Navîn perspektîfekî herî mezin e. Van di peyamên Rêber Apo yên dawîyê de jî, banga goftûgo û çareseriyê dike. Rêber Apo dixwaze bi hewildanên xwe yên mezin û aşitîyane vê pirsgirêkê demildest çareser bike. Ev bang ji hemû aliyên muxtap re ye. Di serî de ji gelê Kurd, Tevgera Azadiyê û hikûmeta AKP-MHP'ê re Rêber Apo vê bangê dik e. Rêber Apo ev bang weke manîfestoyekî girîng dide pêşîya aliyên peywendîdar. Desteya DEM Partiyê dîsa hevdîtinek bi Rêber Apo re pêkanîn. Di heman bingehê de, destê partîyên ku di parlementoya Tirkiyê de cih digirin çend rêze hevdîtin hat kirin. Nêrîn û pêşniyarên wan jî hatin girtin. Derheqê naveroka wan hevdîtinan de em zêde ne agahdarin, lê ji bona pêvajoyekî bê pirsgirêk rêve biçe, pêwîste raya giştî weke erk ji xwere bibîn e. Ev serlêdan û nêrîn girtin ne bi tenê bi partîyên siyasî yê Tirkiyê re, di heman demê de aliyên kurdî û civaka sivîl re jî bê meşandin. Wê encamê van serlêdanan jî, bi Rêber Apo re bê parve kirin. Li ser van jî dê nirxandinên Rêber Apo ji raya giştî re bê parve kirin. Piştî pêvajoyek ku evqas şer û pevçûn, hevdîtîn û pêvajoyek wisa bi Rêber Apo re kelecan di dile herkesê de avakir. Ji aliyê hikûmeta AKP-MHP'ê ve her rê û rêbazên şer hatin meşandin. Ev ji aliyê raya giştî ve bi bertek hat pêşwazî kirin. Ji ber ku herkesê jî bi wê rastîyê baş dizanî bû ku ji bilî Rêber Apo ti kesê din nikare alozî û pirsgirêka heyî çareser bike. Ev pêvajo ne weke pêvajoyên berê ne, pêwîste wek berê nebin jî. Nexwe rewşa Tirkiyê û Rojhilata Navîn dê bikeve aste metirsiyê û dê qeyran mezintir bibin. Em wek tevger, hertim pêvajoyekî ku Rêber Apo û gelê Kurd pêşengtîya wê dike piştgrî dikin. Ev bingeha lêgerîna çareseriyê ji bona aşitiyê divê bê bersiv neyê hiştin.

**Heya çi astê dewleta Tirk ya dagirker bi şêwazekî cidî nêzî vê pêvajoyê dibe? Rewşa Tirkiyê û herêmê ber bi kûve diçe?**

Ev pêvajoya tê behskirin me weke tevger neda destpêkirin. Ji aliyê rayedarên AKP-MHP'ê ve hat ragihandin. Serokê MHP'ê (Partiya Netew Perest a Tevger) Dewlet Bahçelî dema parlementoya Tirkan betlane xelaskir derbasî xebatên xwe dikir, bi şêwazekî ti kes bendê nebû, silav da parlementerê DEM Partiyê. Piştra jî bi daxuyanîyekê ev mijar û silav dayin kir rojeva parlementoya Tirkan. Ev heya ku bi ragihandina hevdîtinên li gel Rêber Apo jî birin. Di raya giştî de jî, ev pêngav girîng hat dîtin û nirxandin. Hîn navê vê pêvajoyê jî ne hatiye dayin. Hikûmeta AKP-MHP'ê û rayedarên dewletê zimanê ku bikar tînin zimanê gef û tûndiyê ye. Ne zimanê çareseriya weke ku Rêber Apo pênase dike û hewil dide pêş pêxe. Pêwîste ev zimanên ku rayedarên hikûmeta AKP-MHP'ê bikartînin were guhertin. Ji milekî din ve jî hevdîtin li gel Rêber Apo çêdikin, girtin û kuştinê zêde dikin. Qeyuman davêjin li ser vîna gelan, êrîşên li ser Rojavayê Kurdistanê jî bê navber didomînin. Ev kiryarên wisa ti caran nayên pejirandin û pêşiya goftûgoyan dê bibe asteng. Ger bi riya çareseriyê danûsitandinên siyasî bêne kirin, em weke tevger û gel jî amade ne. Ji bona wê jî zimanê goftûgoyê pêwîste bikarbînin, ne zimanê gef û tûndîyê. Ev derfetên ku Rêber Apo bikare bibe muxatabê çareseriyê pêkbîne. Pêwîste Rêber Apo tenê weke kesayetekî neyê bi dest girtin, weke rayedar û pêşengekî gelê Kurd û gelên azadîxwaz bê dîtin. Rêber Apo, ji bona bikare ji pêvajoyê re bibe bersiv hevdîtinan dike û pêşniyara kîjan kesayetan dike dibe ev bê pejirandin. Desteyên ku Rêber Apo pêşniyar kiriye bikaribe nêrînên xwe pêre parve bike, pêwiste ji Rêber Apo re derfetên ku bikare kar û xebatê bike bê dayin. Ev hevdîtinên xwe jî, bikare li gel Tevgera Azadiyê bi şêwazek bi ewle parve bike. Rêber Apo vana bi 3 xalan tîne li ser ziman; Ewlekarî, tendûristî û tevgera rehet. Ji ber wê yekê hikûmeta AKP-MHP'ê û rayedarên wê divê vê carê cidî nêzî pêvajoyê û hewildanên Rêber Apo bibin. Em wekî Tevgera Azadiyê li vê carê weke berê nêz nabin û yên ku astengiyê jî derxînin em bi ti awahî napejirînin. Ger ku daxwaz û derfetên Rêber Apo neyên pêkanîn ev pêvajo nayê meşandin. Pêwîste yên hemberî me jî, cidî nêzî vê pirsgrêkê bibin. Ev pirsgirêkek kevnare û 200 salan zêdetire jî didome. Pêwîste demildest bê çareserkirin. Em wek gel û tevger jî hewildidin bi riya goftûgo û danûsitandinan wan pirsgirêkan çareser bikin. Ji ber ku em ne kurdê berê ne û ezmûnên me yên salan çêbûn e. Ji ber wê yekê bangawaziya me ji bona aliyên vê pêvajoyê dimeşînin em vê pêvajoya bi pêşengtiya Rêber Apo serbixin û bixwe bawer nêzî bibin.

# Rengê HTŞ'ê, baqê nîskê!

**Reşo Meydana**

Dema ku rejîma Baas li Sûriyê hilweşiya bi rastî jî hemû ol û bawerî, û gelên li Sûriyê nefeseke baş girtin. Ji ber ku bi dehan sal êş kişandibûn, şaş yan jî rast di astekê de têkoşîn meşandibûn niha jî ew zext û zora li ser milê wan rabibû. Angu rewşeke wekî şoreşê hatibû jiyîn. Lewra ew encama keda gelan bû. Her wiha navê şoreşê li vê qonaxê kirin zêde ne tiştekî şaş e.

Lê belê çi bû? Hin hêzên wekî HTŞ'ê ji valatiya derketiye feyde girtibûn û çûbûn li Şamê rûnîştibûn. Ya rast ev valahiya piştî rejîma Baas'ê di astekê de berhema hêzên li cîhan û herêmê hakim bûn. Ji ber ku armanca wan a esasî tasfiyekirina rejîma Esad û şikênandina Hîlala Şîa bû. Ji bo vê armanca xwe di kîjan astê de HTŞ'ê yan jî bi hêzên cuda re tifaqên veşartî û vekirî çêkirin nayê zanîn. Ya ku li ber çavên dinya-alemê qewimîbû; HTŞ'ê bêyî ku bi bertekek cidî re rû bi rû bimîne di çend hefteyan de hat li Şamê konê xwe veda. Angu hêzên li cîhanê serwer di maneyekê de rêya Şamê ji bo HTŞ'ê xweş kiribûn. Ku ji ber vê yekê hêzeke wekî HTŞ'ê ku hê jî di lîsteya terorê ya Ewrûpa û DYE û hêzên dewletdar de ye, hat û li Şama Şerîf rûnîşt.

Piştî wê tiyatroya alemî dest pê kir. Ji Almanyayê bigire heya bi Îraqê her hêz bi şêweyekî bi HTŞ'ê re kete têkiliyê. Temam, di têkiliyên dîplomatîk de tiştekî ecêb were dîtin tine. Lê gelek nêzîkbûnên heyî ji HTŞ'ê re, derxist holê ku nirxên wekî mafê mirovan, mafên jinan, mafên gelan li ba dewletên têkildar zêde ne girîng e. Mînak, ruxmî ku serokê HTŞ'ê bi xêrhatina wezîrê karê derve yê Almanyayê nekir jî, wekî dewlet zêde seknek raber nekirin. Gelek dewletan wekî ku Misilmanekî/e mumîn Kabeyê tawaf bike, Colanî tawaf kirin. Hin dewletan ji bo ku nîşan bidin çiqas li ser rêya heqê mirov in, jê niyazkirin ku her kesê li Sûriyê di rejîma ku Colanî ava bike de hebe.

Wî (Colanî) çi kir? Çû li Şamê hemû qetil, tecawizkar, diz, dijminên jinan hwd li hev kom kirin û kirin wezîr û kizîr. Xweziya Apê Mûsa sax bûya ev rewş ji me re şîrove bikira! Baweriya me pê heye niha me dibihîze. Lê em bi wî nahesin. Ji ber ku em li dinyaya fanî ne, û ew jî li goşeyê xwe yê li cinnetê ye. Bi por û rihên xwe yên spî, bi çarmerkî rûnîştiye û şîretan li derdora xwe dike. Jixwe em dengê wî nabihîzin lê her kesê nivîsên Wî xwendibe, ji hikmeta wî zer-î misqal sûd wergirtibe dikare texmîn bike ka Apê Mûsa çi şîret dike: "mêrik heqê her kesî da wî. Ya dizane, dike!"

Em ya rast bêjin, me nekariye hemû şîretên Ape Mûsa binivîsin. Ew ê ji me re pir giran bihata, hem ji gelan re û hem jî dewletên hêzên hegemon re pir giran biaxiviya. Wekî bi Kurdî dibêjin,'Yê dizane, dizane, yê nizane boqê nîskê ye'. Eger li vê dinyayê û li vî welatî ku jê re Sûrî tê gotin, bermahiyên El-Qeîde û DAIŞ'ê bi qasî bibin wezîr û kizîr, zane werin hesibandin, çi li para me dikeve, ez bawer im ti kes naxwaze bibîhîze!



# 'Daxwaza gelên Siwêdayê jî pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser e'

Yek ji endamên şandeya MSD'ê ji bo Siwêdayê Fewzî Şingalî da zanîn ku armanc ji civîna ku MSD'ê li Siwêdayê li dar xist, xurtkirina têkiliyên di navbera gelên Sûriyê de bû û got, "Daxwaza gelên Siwêdayê û piraniya aliyên ku me ew dîtin jî pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser e."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Meclisa Sûriyaya Demokratîk(MSD) bi armanca xurtikirina têkiliyan, pê re jî pejirandina sîstemeke guncav ji bo pêşeroja Sûriyê di 28'ê Çileya 2025'an bi rûspî û oldarên Siwêdayê re hevdîtinek pêk anî. Têkildarî armanc û xalên civîn jî sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurd li Sûriyê ku yek ji endamên şandeya ku serdana Siwêdayê kiribû Fewzî Şengalî bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Heftiya bûrî hûn bi rûsipî û oldarên Siweyedayê re civiyan, gelo armanc ji vê civînê çi bû?**

Weke her kes dizane bi dirêjahiya 14 salan gelên Sûriyê ji hev qut bûbûn, ev yek jî bi sedema desthilatdariya ku rêjîmê dimeşand û kirîza ku tê re derbas dibû. Derfet tune bû ku xelkên Sûriyê, tevger û siyasetmedarê wê li hev bicivin û bi hev re biriyarekê bidin. Herwiha di dema rêjîmê de gelên Sûriyê li gelek deveran weke hev dihizirîn û daxwaza wan yek bû, lê nikarîbûn têkiliyan bi hev re ava bikin. Piştî ku rêjîma Beas rûxiya û desthiltdariya Şamê ya nû hat, êdî derfeta pêkanîna ger, têkilî û danûstandinan çêbû. Li ser vî esasî jî me li gel şêx û oldarên durziyan peywendî ava kirin û bi wan re civîn li dar xist. Li gel wê jî li Şamê û hin deverên din têkilî bi hêzên muxalefetê yên kevin û kesayetên serbixwe re hat kirin. Di dema heyî de li gelek deverên Sûriyê hevdîtin, komcivîn û civînên aliyên siyasî, rewşenbîrî, civakî û hwd… li pêş dikevin. Wekî em dizanin ku di vê rewşa ku em tê re derbas dibin ev hevdîtin gelekî girîng in ji bo yekhelwestî û nerînan. Di heman demê de weke gelê kurd û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewcedariya me bi van hevdîtinan ji bo diyarkirina daxwazên me heye. Em jî weke MSD û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi riya van danûstandinên xwe bi hemû aliyên Sûriyê re dixwazin bigihêjin çareseriyekê ji bo Sûriya siberojê.

**-Xalên ku di vê civînê de bi giranî hatin nîqaşkirin çi bûn û çi encam jê derketin?**

Naveroka civîna ku li Siwdayê hate çêkirin li ser guhertina rêjîmê, hatina rêveberiya Demkî li ser desthilatdariyê û pêşeroja Sûriyê bû. Pê re jî destnîşankirina serokê Sûriyê, hem jî guhertina berleman û meclisan hatin nîqaşkirin. Li aliyekî din nîqaşa kongreya Netewî tê kirin, me tekez kir ku pêwîste ev kongir bi beşdariya hemû aliyên siyasî, civakî û olî bi hemû pêkhate, baweriyên sûrî bê lidarxistin. Herwiha ev kongir bibe gavek ji bo çêkirina desteyek di warê sazkirina destûrekî nû de ku xebatê ji bo Sûriyeke demokrat bide meşandin. Bê guman jî em gelekî girîngî didin wê yekê ku divê hemû alî bi rengê xwe ne bi rengekî ferdî tevlî kongreyî bibin. Herwiha destûrk bê avakirin bi beşdariya hemû gelên Sûriyê û ev destûr bibe gerentorê hemû aliyên Sûriyê di pêşerojê de û hemû gelên Sûriyê mafê xwe di vî destûrî de bi dest bixe. Encamên ku ji vê civînê jî derketin ew bû ku me herdu aliyan li ser van xalan erê kir. Di rastiyê de em neçûn Siwêdayê ku peymanan çêbikin an jî biriyaran bidin, lê belê xalên guncav ji bo Sûriya siberojê û gelên Sûriyê hatin pejrandin.

**-Ji bo ku sîstemeke guncav ji bo rêvebrina Sûriyê pêk were, pêwîste çi gav bên avêtin û di dema heyî de daxwazên piraniya gelên Sûriyê çi ne ji bo Sûriyeke demokrat û aştiyane?**

Daxwazên biraderên me yên Siwêdayê û gelê durzî jî mîna daxwazên me ne, ew jî mîna me Sûriyeke pirreng, demokratîk û nenavendî dixwazin. Wan jî dan diyarkirin ku eger ev yek li Sûriyê pêk neyê, Sûriyê vegere weke serdema rêjîma Baasê û dewleteke yek netew, yek al û yek ol dûrî ilmaniyetê û demokrasiyê ava bibe wê tevlîheviyeke pir mezin çêbibe. Di



encamê de wê şerê navxweyî li pêş bikeve û Sûriyê ber bi parçebûnê ve biçe. Di van hevdîtin û têkiliyên ku me bi gelek aliyên Sûriyê re çêkir gelek kesan digot gelê kurd li Bakur û Rojhialtê Sûriyê xebateke mezin û bêhempa di van salên şoreşê de da meşandin. Van aliyan xweziya xwe bi pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser li herêmên xwe anîn ziman, herwiha digotin we dikarîbû xwe bi rê ve bibin, hêzeke xwe ava bikin û li ser asta dîplomasî xebatê bidin meşandin. Hemû aliyên ku me hevdîtin bi wan re çêkirin, Sûriya sîstema Rêveberiya Xweser pirreng dipejirand ji bo Sûriyê giştî. Projeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê projeyek sûrî ye, divê hemû sazî, partî, hêzên leşkerî û hwd… hevdîtin û têkiliyan bi hemû aliyên Sûriyê re çêbikin, divê ev têkilî jî ne tekane bin. Niha hemû gelên Sûriyê daxwaza wan ew e ku di Sûriyeke nenavendî de, mafê wan bên parastin û hêviya gelan ji rêveberiya nû ew e ku daxwazên wan bi cih werin.

## Şoreşa Rojava tê dizîn



**Zekî Bedran**

Hilweşandina rejîma Baas ji bona gelên herêmê serkeftinek bêhempa bû. Lê pirsgirêka herî bingehîn şûna rejîmê kê bê danîn? Carna hêvî û bendewarî vala derdikevin. "Bihara Ereban" lêgerînek mezin û serhildanek bû, lê berovajî bendewariyan bihar zivîrî zivistanê. Bihara gelan ji gel hat dizîn. Gel jî ne hatibûn birêxistin kirin. Partî û rêberên ku pêşengiyê bikin, derneketin holê. Berjewendparêz û hevkar bi hêzên emperyalîst re peyman çêkirin û rê li guhertin û şoreşan girtin. Rojhilata Navîn hê jî bi pirsgirêkên giran re têdikoşe, rûpelên bi xwîn û tarî nehatin girtin. Hebûn û hêza emperyalîstan li Rojhilata Navîn ji lawazbûnê zêdetir xurttir bûye. Di heman demê de, Rojhilata Navîn ji milê Israîlê ve jinûve tê dizayn kirin. Tê xuyakirin ku hewildan ji bona dizîna deskeftiyên şoreşa Rojava hene. Li şûna şoreşê bendewarî ji guhertina desthiladariyê ve tê girêdan. HTŞ'a ku li Şamê bicih bûye, pey li Sûriyeke gor xwe avakirinê ye. Daxuyaniyên Ehmed Şeraa jî, tê xuyakirin ku wê şoreşê bidin kêlekekî. Bi xulase gotin ku şoreş qediya, em ê bi avakirina dewletekê dest bi kar bikin. Ev dewleta tê avakirin jî, pir zelal e ku ne berhemekî hişmendiyekî demokratîk e. Bi israr hewildidin ku dewletekî navendî bidin avakirin. Êdî eşkere bûye ku armanca wan dewleteke ku her tişt ji yek dest û navendê tê birêvebirin e.

Di devê rêvebirên HTŞ'ê de têgeha demokrasîyê nayê bihîstin. Ew ê çawa şoreşa Sûriyê pêş bixin û destkeftiyên xwe mayînde bikin. Bêyî ku hişmendiyekî demokratîk ku bawerî, nêrîn û çandên cuda tê de nebe û li ser bingeha hemwelatîbûna wekhev bê avakirin? Divê hemû derdorên rewşenbîr û demokrat di vê pirsê de, israr bikin. Me berê jî gotibû, xweşîya ji hindir de vala xeter e. Serokên HTŞ'ê ji kevneşopiyeke dijî demokrasîyê tê. Baweriya wan bi wekheviya gelan û nêrînên azad nayê. Gelo ev hişmendî dikare bibe pêşeng ji bona hemû gelê li Sûriyê tevahî de bi awayekî wekhev bijîn?

Eşkere ye ku Sûriyê ku navendîparêz e û xwe dispêre desthilatdariya yekpartî, di çi rewşê de ye li holê ye. Gelo netew-dewletek navendîparêz, ku dikare Sûriyeya hilweşiyayî ji nûve vejîn bik e? Gelo ger serkirdeyên HTŞ'ê rihên xwe hinekî dirêj bikin û kirevatan li xwe bikin hewl bidin ku xwe ji aliyê hêzên biyanî ve bidin pejirandin, dê azadî bikeve Sûriyê? Dibêjin ew hatine guhertin, lê kiryarên wan li gorî pergala Baas'ê ye. Tenê rêveberên HTŞ têne cem hev û diyar dikin ku dewleta nû çawa ava bikin. Serokatiyê vesaz dikin. Saziyên dewleta kevin, makezagon û hwd. Ji holê radikin, biryara avakirina artêşeke nû didin. Ew ê desteya makezagoneke nû diyar bikin. Ew jî wê kongreya netewî bixwe kom bikin.

HTŞ dixwaze şoreşê yekdestdar bike. Ji ber wê jî nûnertiya gel û nêrînên cûda paşguh dike. Ev lihevkirinek bi zanebûn e. Rêveberiya Erdogan di vî warî de wêrekîyê dide wan. Du sedemên sereke hene ku Erdogan ev yek kir. Ya yekem tine hesibandina kurdan û bê statûya kurdan e. Ya duyemîn jî serdestiya Îxwan (birayê Misilman) û Îslama Selefî ye. Erdogan li Misirê li ser Mûrsî sermiyanekê mezin kir. Lê, ew tasfiye kirin. Di heman demê de xwest bi Hamasê re jî tevgerê bike, lê encamek ku tê xwestin neda. Niha jî dixwaze polîtîkayên xwe yên berfirehkirina li Rojhilata Navîn ya ku xwe dispêre HTŞ'ê bidomîne. Ew jî armanc dike ku vê yekê li ser siyaseta navxweyî nîşan bide û desthilatdariya xwe mayînde bike.

Di asayî de diviyabû HTŞ'ê nûnerên hemû gelan û hêzên rêxistinkirî yên li Sûriyeyê dijîn bigirta. Ev ne karekî pir dijwar e. Ne hewce ye ku ew di destpêkê de bêkêmasî be. Divê li ser mijarên ku biryarên jiyanî tên girtin desteyên hevpar ava bikin, goftûgoyan bimeşînin û encaman ji raya giştî re ragihînin. Niha ew bi kesên derdora xwe yên ku bi tevahî jî alîgirê wanin, li ser hemû mijarên girîng biryaran didin. Li beşeke girîng a welêt Rêveberiya Xweser heye. Ev rêveberî jî ji kesên xwedî ezmûn û rêxistinkirî pêk tên. Hejmara herêmên Rêveberiya Xweser nêzîkî 5 mîlyon e. Dev ji van herêman berdin, ew jî hewce nabînin ku bidin diyarkirin ew ê lêkolînek wiha bikin. Gel û komên baweriyên din ên wekî Durzî, Elewî, Asûrî, Siryan jî hene. Kêm û zêde, ew jî birêxistinkirî ne, di wê pozîsyonê de ne ku nûnerên xwe hilbijêrin. Lê HTŞ'ê naxwaze van hêzan tevlî avakirina Sûriyeya nû bike. Dixwaze qaşo meclisa neteweyî ya ku dê bicive û herwiha desteya makezagonê jî bixwe diyar bike.

Di rewşa heyî de, ev gelê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, weke welatiyên xwe nabînin. Li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê ti gotinan nabêjin. Dewleta Tirk bi çeteyên di bin fermandariya xwe de komkujiyan pêk tîne. Bi 100 hezaran welatiyên Şehba û Til Rifatê neçar man koçber bin. Gelê Efrînê û herêmên din ên dagirkirî nikarin vegerin warên xwe. Tişrîn û Qereqozaqê bi mehan e di bin êrîşan de ne, HTŞ'ê li hemberî van kiryaran bêdeng e. Di vê rewşê de wê çawa pêk were ku hemû gel û hemwelatiyên Sûriyê bibin yek û dibin sîwanekê de jiyan bikin? Gelê Sûriyê bêyî ku xwe birêxistin bike û hêzên xwe bike yek nikare diziya şoreşê rawestîne. Di rewşa heyî de Sûriye jî mîna rejîma Baas ber bi avahiyeke tundrew û navendî ve tê birin.

## Tîfaqa çaremîn a Kurd û Tirkan



**Farûk Sakik**

Hevpeyvîna Omer Ocalan a di Televizyona Rûdaw de gelek hat nîqaşkirin. Di beşek axaftina xwe de dibêje, Rêber Apo got, "Ger Tirkiye xwe ji çareseriyê re amade neke, di paşerojê de gelek planên hêzên navneteweyî wê li ser Sûriye, Iraq, Îran ê bikevin dewrê. Li vê derê îhtîmalek jî heye ku dewletek bê ragihandin"

Omer Ocalan, di axaftina xwe de kêmasiyek kir. Dikaribû hîç behsa vê hevoka "Li vê derê îhtîmalek jî heye ku dewletek bê ragihandin" neke.

Rêber Apo ew hevok çawa bikaranîbû îzah nekir. Her wekî hemû hêzên emperyal hatine cem hev biryarek dane û wê dewletek-Kurdistanek îlan bikin û Abdullah Ocalan li dijî vê yekê derdikeve. Gelek kesan, ev hevok anîn li gor xwe şîrove kirin û Rêber Apo wek hedef nîşandan. Kampanya reşkirinê dane destpêkirin. Bi bêwîjdanî tevgeriyan. Têkoşîna vî kesî yên 50 salî ji bo doza Kurdistan ji bîr kirin. Ji xwe ji berê de Rêber Apo her tim digot, 'Ev doza Kurdistan bi Tirkan re tê çareserkirin'

Dema ku ev nirxandin dike, vê pêvajoyê dişibîne serdema ku Mûsul dane Îngilîzan. Di 4'ê Mijdara sala 1922'yan de li Meclîsa Tirk li ser amadekariyên Peymana Lozanê rûniştin pêk dihatin. Di serî de Mebûsê Bedlîsê Yûsif Ziya gelek mebûsên Kurd di vê rûniştinê de, wek Rêber Apo ji heyeta Tirk xwestin ku di hevdîtinên Lozanê de ew ti carî qebûl nekin ku Mûsul (Başûrê Kurdistanê) Heleb (Rojava) ji Tirkiyê bê veqetandin. Lewra ew xaka Kurdan e û Kurd û Tirk jî bira û xwedî heman qederê ne.

Rêber Apo leyîstokên ku îroj tên leyîztin dişibîne piştî ku Mûsûl dane Îngilîzan. Yûsif Ziya jî wê demê li ser vê mijarê digot; "…Derdê Îngilîzan Kurd nebûn petrola Mûsul û Kerkûkê bû. Ku wê demê wîlayeta Mûsul tevahiya Başûrê Kurdistan di nav sînorê xwe de dihewand"

Îngilîz wê demê jî tu carî ji bo Kurdan gavek neavêtin. Hin peyam û sozê wan jî ji bo xapandina Kurdan bû. Dema ku li Lozanê, Lord Kûrzon ji bo mafê Kurdan israr dikir, israra wî mafê Kurdên Mûsulê bitenê bû. Li heremên Kurdistanê yên petrol tunebû xema wî nebû.

Îrojî hêzên hatine Rojhilata Navîn û xwedê negiravê ji bo maf-doza Kurdistan daxwiyaniyan didin, çima ji bo Bakur û Rojhilatê Kurdistan nadin. Rêber Apo ev yek dîtiye û midaxleyî vê yekê dike.

Piştî ku Mûsul dane Îngilîzan, Şêx Mehmûd Berzancî li dijî vê yekê derket û li hember Îngilîzan serîhilda. Di heman demê de balafêrên Îngilîzan dest bi bombekirina başûrê Kurdistanê kirin.

Rêber Apo vê îhtimalê dide da ku ew balefirên Îngilîzan carek din li asîmanên Başûrê Kurdistan xuya bikin. Haa, di hişmendiya dewleta Tirkiyê de guhertin çêbû? Na. Desthilatdariya Tirkiyê ya îro jî wek wan bapîrên xwe tevdigerin. Rêber Apo dixwaze wan îkna bike. Xeletiyên wan yên dîrokê bibîra wan bixe.

Di hedefa Tirkiyê ya îroj de dîsa Mûsul(mîsakî Mîllî) heye. Dewleta Tirkiyê bi serê xwe vêderê bidest bixe wê feleketa mezin were sere Kurdan. Ji bo qirkirina Kurdan serdemek nû wê destpêbike. Heger di destê hêzên navnetewî de jî bimîne, wê bi qasî varîlên petrolê maf bidin Kurdan.

Rêber Apo di vê derê de dikeve dewrê. Dixwaze ev herdû gel dîrokek wana bihevre hebe. Di dîrokê de 3 tifaqên wan çêbûne; şerê Milazgirê, şerê Çaldiran û şerê Îstîklalê. Dixwaze îroj tifaqa çaran pêkbîne. Em dibînin ku îroj ev dewleta ku di dijminatiya Kurdan de israr dike, îkna bû ye bi Rêber Apo re hevdîtin daye destpêkirin.